Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 62
30'ê Nîsanê
Buha: 150 Tûmen


agirî

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

## Roja Cîhanî Ya Kedkaran Pîroz Be

1'ê Gulana 2007'an, Roja Cîhanî ya Kedkaran e. Bi vê boneyê, em pîrozbahiyên xwe ên germ ji tev Kedkar, pale û zehmetkêşên cîhan û Kurdistanê dikin. Hêviya me serkevtina xebat û tekoşîna karkeran û gihîştina wan bi jiyaneke wekhev, rihet û birûmet e.

***Desteya Weşana Agirî***



# Îran, Pileya Duyemîn Di Warê Îdamê De


Gera Dîplomatîk Ya Birêz Hesen Şerefî Li Ewropayê Berdewam E



2

Bandora Dorpêçên Aborî Li Ser Aboriya Îranê ...



3

Roja 2'ê Banemerê Weke Roja Xwendekarê Kurd ...

5

Vergeriyan Ber Bi Paşverûyiyê



7

4'emîn Konferansa Bedirxaniyan...



9

GOTIN



10



Pêka gotinên berpirsên Rêxistina Efûya Navneteweyî, biryarên Îdamê di Îranê de li gorî sala 2005'an, di sala borî de duqatan zêde bûye.

Li gor rapora ku ji aliyê Rêxistina Efûya Navneteweyî hatiye belavkirinê, Îran hejmara herî zêde ya biryarên darvekirinê bo kesên ku li jêr temenê yasayî de ne, heye.

Rapora han herwiha eşkere dike ku hejmara kesên ku di sala borî de bûne goriyên hikmê îdamê, di welatê Çînê de bûne (1010 kes), piştre Îran (177 kes), Pakistan (82 kes), Îraq (65 kes), Sûdan (65 kes) û Amerîka (53 kes).

Di vê raporê de hatiye ku yek ji sê ya wan 24000 girtiyên ku di gişt cîhanê de çavnihêrê biryara îdamê ne, di welatê Pakistanê de ne.

Seyîd Husên Mosewî Tebrîzî, Dadwerê berê yê Îranê dibêje ku cezayê lidarvekirinê hewcehiyeke ku Ola Îslamê bo desthilatdarên civakê diyarî kiriye da ku bona cezakirina kesên ku yasa û ewlehiya civakê dixine tirsê, bi kar bînin.



## Nuklera Îranê Di 10 Rojan De Bi 1000 Raketen Dikare Ji Holê Rabe



Serokwezîrê Îsraîlê Ehud Olmert got programa nukleerê ya Îranê di 10 rojan de bi 1000 raketên Cruiseyê dikare ji hole rabe.

Olmert di daxuyaniya ji bo kovara almanî Focusê de bersiva pirsa heke Îran dom bike gefan li NY bixwe dê operasyona eskerî ji alternatîfek dibe an na got "em vê ji ber çavan dîr naxin."

Olmert wisa dom kir" Belkî ne mumkun be em hemû programa nukleriyê ji hole rakin lê em dikarin xisareke mezin bidin ku programa wan bi salan vegere berê. Ev dikare 10 roj bigre û bi 1000 raketên Tomahawk Cruise çêbe."

Lê Olmert dibêje "beriya ku em êrîşê Îranê bikin dive destûra NY bigrin û nuha jî nîyeteka me ya êrîşê tune."

## Yekemîn Festîvala Fîlmên Kurdî Ya Parîsê Tê Lidarxistinê




Li paytexta Fransa li Parîsê wê di navbera 23-30.10.2007 de yekemîn festîvala fîlmên kurdî ya Parîsê were li darxistin.

Hate ragihandin ku festîval wê li cihê bi navê Latin Quarte çêbibe.

Ev festîval ji aliyê CCAK (Yekîtiya Hunermend û Nivîskarên Senaryo) ve wê were li darxistin.

Tê plankirin ku hejmareke mezin ji derhêner û fîlmên kurdî beşdarî festîvalê bibin.

Ji kesên ku wê ji bo festîvalê werin dawetkirin: Behmen Qobadî, Huner Selîm, Ehmet Zîrek, Mensur Tural, Kazim Oz, Bêrîvan Binevş, Jelal Jonroy, Mano Khalil, Nizamettin Aric û gelekên din.

Yekîtiya bi navê CCAK di sala 2006 de ji aliyê hejmarek hunermend û nivîskaran ve li Parîsê hatiye avakirin.

www.arsivakurdi.org

# Gera Dîplomatîk Ya Birêz Hesen Şerefî, Cihgirê Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Li Ewropayê Berdewam E

## Hevdîtin Tevî Balyozê Berê Yê Fransayê Û Şêwrimendê Wezareta Derve Ya Wî Welatî Di Pirsên Navneteweyî De



Birêz Hesen Şerefî, Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îran û birêz Dr. Xusro Ebdulahî, berpirsê têkiliyên navneteweyî yê PDK Îranê li derveyî welat, demjimêr 10'ê sibêdeya roja 19.04.2007'an, hevdîtinek tevî birêz Bêrnard Doran(Bernarda Dorin), dîplomatê bi nav û deng ê Fransayê, piştevanê biemeg yê tevgera rizgarîxawzane ya Kurd û her wiha hevalê nêzîk yê Şehîd Dr. Qasimlo, li Parîsê hevdîtinek pêk anîn.

Di vê hevdîtinê de her du aliyan rewşa aloz a herêmê, kirîza navikî ya Îranê, rola Kurdan nemaze Kurdên Kurdistana Îraqê di Rojhilata Navîn de, gefên Îran û Turkiyê derheq pirsa Kurdan li Îraqê de û rewşa Îranê, dahûrandin.

Di axavtinên xwe de birêz Şerefî, sipasiya xwe ji piştevaniya hemû alî ya birêz Bêrnard Doran, ji tevgera mafxwaziya Kurdan kir û hevdem tevî şirovekirina helwestên PDK Îranê, bal kişande ser rewşa aborî, civakî, siyasî û çandî ya Îranê bi giştî û her wiha tevgera azadîxwaziya gelên Îranê û nemaze bizava xortên gelên bindest ên Îranê di pêxema bidestveanîna mafên rewa yên xwe di rêya avakirina sîstemeke demokratîk û federal di Îranê de.

Di dawiyê de birêz Bêrnard, kêfxweşiya xwe ji vê hevdîtinê anî ziman û qala parek ji serhatiyên xwe yên tevî nemir Dr. Qasimlo kir û got: "Dr. Qasimloyê nemir, bi rastî rêberekî zana, siyasetmedar û dîplomatekî hêja û bitecrûbe, demokratekî bi pirensîp û azadîxwazekî wefadar bi armancên gelê xwe bû".

Her wiha navhatî li ser piştevaniya xwe ji xebata gelê Kurd li Kurdistana Îranê de birêbriya PDK Îranê, tekez kir û got: "Rêwîngên rêya pir ji şanazî ya Dr. Qasimlo, erxayîn dikim ku dikarin li ser piştevaniya hemû alî ya dostên xwe hisabê bikin".

Hêjayî gotinê ye ku birêz Bêrnard Doran, di sala 1968'an de, tevî tevgera Kurdan nasiyar bûye û mideheke di herêmên serbest bûyî yên Kurdistana Îraqê di dema şoreşa nemir Mela Mistefa Barzanî de, maye û piştre Dr. Qasimlo, nas kiriye. Navhatî karê xwe yê dîplomasiyê di Wezareta Derve ya Fransayê de dest pê kir û gihîşte pileyên bilind. Her wiha Balyozê Fransayê di Afrîqaya Başûr, Îspaniyayê û Berîtaniyayê de bûye û wekî şêwirmend di pirsên navneteweyî de têkilî tevî Wezareta Derve ya welatê xwe hebûne.

## Hevdîtin Tevî Jan Klodlofor, Nûnerê Parlemana Fransayê

Roja duşem, 27.01.1386(16.04.2007)'an, birêz Hesen Şerefî, Cîgirê Sekreterê Giştî û birêz Xusro Ebdulahî, berpirsê têkiliyên navneteweyî yê PDK Îranê li bajarê Parîsê, hevdîtinek tevî birêz Jan Klodlofor(Jean – claude lefort), Parlemanterê Fransayê, endamê şanda Parlemana vê Parlemanê derheq pêwendiyan tevî Yekîtiya Ewropayê û her wiha endamê Komîsyona Pêwendiyên Derve yê Parlemana Fransayê pêk anîn.

Di vê hevdîtinê de ku demjimêrek û nîvan dom kir, her du aliyan li ser pirsên rojê ên herêmê, rewşa giştî a Îranê, xebata azadîxwazane a gelên Îranê bi giştî û neteweyên bindest bi taybetî bîr û ra guherîn.

Di vê hevdîtinê de her du alî bi baldan bi rola têkderane a rejîma Komara Îslamî ya Îranê di pêkanîna pirsgirêkan û her wiha çêkirina arîşe û kirîzan di Rojhilata Navîn de, maytêkirin di kar û barên hundirîn ên welatên herêmê, bi taybet ji rêya piştevanîkirinê ji girûpên tundrew û têkder û binpêkirina yasayên navneteweyî, hatine ser vê baweriyê ku tenê rêya usûlî û berpirsyarane ku dikare arîşe û pirsgirêkên herêmê û her wiha cîgirkirina aştiya hertimî di herêmê de misoger bike û ji aliyê gelên herêmê ve piştgirî jê bihê kirinê, pêkhatiye ji guherînên micid di siyasetên heya niha ên welatên Rojavayî, bi taybet Yekîtiya Ewropayê li derheq Komara Îslamî û rejîmên dîktator ên herêmê, ev guherîna siyasetê jî divêt ji rêya desthilgirtin ji siyasetên danûstandin tevî van rejîmane û piştevanîkirina menewî û siyasî ji tevgera azadîxwazane a gelên herêmê, ku ji rêya demezrandina sîstemeke demokratîk de birêve diçe. Sîstemek ku mafê mirovan û yasayên navneteweyî liberçav bigire, hekene hêvî bi pêkanîna guherînên bingehîn di herêmê de ji bilî xewn û xeyalan tişteke din nine.

## Seredana Bîroya Hilbijartinan Ya Xatûna Sêgolîn Royal'ê, Kir

Birêz Hesen Şerefî, Cîgirê Sekreterê Giştî û endamê Deftera Siyasî ya PDK Îranê, bi hevrêtiya birêz Dr. Xusro Ebdulahî, berpirsê têkiliyên derve yê PDK Îranê li derveyî welat, roja 24.01.1386(13.04.2007)'an, seredana bîroya hilbijartinan a xatûna Sêgolîn Royal(Seyolen Royal)'ê, berendama Partiya Sosyalîst ji bo hilbijartinên Serok Komariya Fransayê, kir û ji aliyê birêz Kerîm Pakzad, yek ji berpirsên Deftera Têkiliyên Navneteweyî yê Partiya Sosyalîst û berpirsê têkiliyan tevî Îran, Efxansitan û Pakistanê ve, pêşwazî jê hate kirin.

Di civînekê de ku nezî bi demjimêrekê dom kir, her du aliyan li ser rewşa Rojhilata Navîn, nemaze rewşa Îran û Kurdistanê, axavtin û bîr û ra guherîn. Tewera sereke ya bas û nîqaşên vê civînê, pirsa navikî ya Îranê, binpêkirina berfireh a mafê mirovan û azadiyên gel di Îranê de ji aliyê rejîma serberedayî ya Melayan ve û her wiha ronkirina helwestên her du partiyan (PDK Îranê û Partiya Sosyalîst) di vê derheqê de bû.

Birêz Şerefî, di axavtinên xwe de tekez li ser vê çendê kir ku nabe civaka navneteweyî di pêwendî tevî Îranê de xwe girê bide bi pirsa navikî û xwe pê mijûl bike, belku divêt di pêwendiyên xwe yên tevî Îranê de, pirsa mafê mirovan û azadiya gelên Îrannê weke bingeh û pîvan li ber çav bigire û piştevaniyê ji tevger û xebata rizgarîxwazane ya gelên Îranê bike.

Her di vê derheqê de birêz Pakzad, hevdem axavtinên xatûna Royal, anîn ber bas ku di roja 12.04.2007'an, di civîneke 4000 kesî di bajarê Mêtsê de kiribûn û anî ziman ku têkiliyên her du aliyan (partiyan) di vê derheqê de bi tevahî weke hev tên û eva jî cihê kêfxweşiyê ye.

Di dawiya civînê de şanda PDK Îranê hin belgeyên bi zimanê Fransayê derheq serkut û binpêkirinên berfireh ên mafê mirovan di Kurdistanê de, pêşkêşî birêz Kerîm Pakzad, kirin.

www.arsivakurdi.org

# Bandora Dorpêçên Aborî Yên Neteweyên Hevgirtî Li Ser Aboriya Îranê

**Reşîd Heyderî**
**Wergerandin: Omîd Esxeran**



Her weke hemû alî haydar in, kirîza Etomî a Îranê herçiqas tê, kûrtir dibe. Karbidestên vî welatî, bi bizarkirineke bêmînak û bi bê liberçavgirtina qazanca giştî a neteweyên Îranê, bêrawestan li ser meyandina Uraniyûmê biîsar in û daxwazên civaka navneteweyî derheq rawestandina meyandina Uraniyûmê, her bi xemsarî red dikin. Ew helwesta nebicî a Komara Îslamî ya Îranê, hetanî niha bûye sedema derçûna biryarnameya 1737'an a Rêxistina Neteweyên Hevgirtî û pesendkirina biryarnameya duyem[1747] di çend rojên borî de. Çavnihêriya vê çendê jî tê kirin ku di pêşerojê de hisarên sepandî bi ser wî welatî tundtir û berfirehtir werin kirin. Eger çi Îran îdeaya vê çendê dike ku bernameya navikî ya wê ji bo armancên aştîxwazane ye, lê cîhana derve ew îdeaya Îranê bi nerast dihesibînin û jê we ne ku Îran di bin de û dûr ji çavê civaka cîhanî, mijûlê çêkirina çekên Etomî ye. Sedema herî bingehîn ya etmosfera bêbawerî di navbera Rojava û Komara Îslamî de, zêdetir ji bo vê çendê vedigere ku Îran heyamê çendîn salan bernameya xwe bi nepenî ragirt û heta lê nehate eşkerekirin, ji kesekê re eyan nekir. Welatên Rojava liv û çalakiyên Îranê derheq bernameyên navikî, bi tirseke mezin bo ser ewlehiya cîhanê dizanin, lewra hatine ser wê baweriyê ku nikarin ji rêya Neteweyên Yekbûyî ber ji vê metirsiyê bigirin.

**Kirîza navikî a Îranê û egera dorpêça aborî**

Derheq dawîanîn bi kirîza navikî a Îranê, çendîn eger di rojevê de ne. Egera yekem ewa ye ku civaka cîhanî li hember îsrarên Îranê derbarê bernameyên navikî yên wê paşdekişiyê bike ku Komara Îslamî weke dewleteke kevneperest û alîgir û piştevanê terorîzmê bibe hêzeke Etomî di herêmê de. Herçend ku Komara Îslamî bi hemû karîna xwe hewlê dide ku ev egere rast vegere û bigihîje vê armancê, lê li nêrîna welatên cîhanî ve, bi egereke qels û lawaza tê hesibandin û nahê qebûlkirin.

Egera duyem ewa ye ku Komara Îslamî di dawiyê de stûxwarê civaka cîhanî bibe û bernameyên navikî yên wê bo herdem bikeve zibildana dîrokê de. Berevajî xwestek û meremên xwe, radest û teslîmbûn li hember givaşa derve, tiştek nine ku Komara Îslamî pê re nasiyar nebe. Vexwarina cama jehrê û stûxwarkirin ji bo agirbestê li şerê tevî Îraqê, belgeyeke bihêz e ku vexwarina cameke din a jehrê bi dûr nine.

Heke hat û tu yek ji du egerên ku me qala wan kir nehatin cî, wê demê divêt Îran xwe ji bo egera sêyem amade bike ku pêkhatiye ji dorpêçên aborî û berfireh ku dûr nine serê xwe li ser vê egerê danê û dawî bi temenê xwe bîne. Helbet bi mercekê ku Opozîsyoneke yekgirtî û bihêz û bi kiryar di holê de hebe ku bikare hemû xelkê vêzar yê Îranê bi hev re li pêxema bidestveanîna armancên hevbeş hev bixe û ber bi asoya serkevtinê rêberî bike. Ji niha ve, egera sêyem weke egera herî baş û bibandor tê hesibandinê û hewl ji bo cî bi cî kirina wê tê dan. Nabe em vê çendê jî ji bîr bikin ku civaka cîhanî her li rojên yekem a destpêbûna vê kirîzê, tu demekê egera êrîşa leşkerî red nekirine. Lê ewa ku mebesta nivîsara min e, egera sepandina hisara aborî ye, ne êrîşa leşkerî.

Niha pirsiyar ewa ye ku heke hat û egera sêyem li ser Îranê were cîbicîkirinê, yanî dorpêça aborî bi ser Îranê de hate sepandinê, dê çi bandorek li ser aboriya Îranê hebe? Gelo aboriya Îranê karîna berxwdan û rawestan li hember wê derba qurs û giran ku di encama dorpêça çavnihêrînekirî lê digire, heye?

Ji bo rohnkirina bersiva dirust ya wan pirsiyarane hewce ye li vir de encamên berlêgirtin ji firotina petrola Îranê, bandora hisarên aborî li ser jordeçûna aborî li Îranê de, kirîza bêkarî û heta dawiyê werin dahûrandin û şirovekirinê.

**Zirarên berlêgirtin ji firotina petrolê**

Aborîzan bi giştî, aboriya Îranê di tevahiya xwe de bi **Aboriyeke xwedî take berhem** pênase dikin. Ew take berhema sereke jî neft e. Bi baldan bi vê pênaseyê, eyan dibe ku ev çavkaniya binirx a xwezayî, ku dûkela wê bo çavê gelên Îranê vedigere, bingeha aboriya welat pêk tîne. Bona vê çendê ku em ji biha û girîngiya petrolê di aboriya Îranê de têbigihîjin, tenê ew çende bes e ku em qala vê çendê bikin ku %90 ji dahata **"erz"** a welat ji hinartina petrolê bo derve tê bidestveanîn û heta %80 xerca dewletê jî ji rêya firotina petrolê ve dabîn dibe. Bi liberçavgirtina qursayî û giraniya petrolê di aboriya Îranê de, eşkere ye ku ji metirsiyên herî mezin ku li encama hisarên petrolê di aboriya Îranê de, eşkere ye ku yek ji metirsiyên herî mezin ku di encama hisarên aborî bi ser Îranê de, bi micidî gefê ji aboriya Îranê dixwe, egera berlêgirtin ji şandina petrolê bo sûkên cîhanî û firotina vê madeya biqîmet di wan bazaran de ye.

Renge li vir de ew pirsiyare were holê ku gelo ewa her Îran e ku hewcehî bi bazarên cîhanî heye? Bes bazarên cîhanî çi? Gelo wan tu girêdayîbûnek bi petrola Îranê tune ye?

Di bersivê de divêt were gotin ku pêwendiyeke nêzîk û kêmnavber di navbera wan du aliyan de heye. Bi wî qasî ku Îranê ji bo zivirandina bazara xwe hewcehî bi firotina neftê heye, her bi wî qasî jî şirket û bazarên cîhanî hewcehî bi kirîna petrolê ji Komara Îslamî hene. Di encam de, egera sekinandina firotina petrola Îranê demekê dê were cîbicîkirin ku faktereke din peyda bibe û soz û peymana gerandina rola Îranê li tejîkirina vê valahiyê û dabînkirina hewcehiyên bazara cîhanî ya petrolê li stû girtibe. Li vir de ye ku welatên Rojava divêt dev ji alî û rêya sêyem berdin. Pisporên warê aborî û siyasî, zêdetir **Erebistana Seûdî** weke mohreyeke baş û jêhatî ji bo li stûgirtina vî rolê girîng dizanin. Sedemên vê çendê jî gelek in. Ev welate ku berî hemû tiştekê bi sedema vê çendê ku xwediyê petroleke zaf e, karîna tejîkirina vê valahiyê jê tê çavnihêrîkirin ku Îranê li encama dorpêçan li ciyê xwe bi cî bihêle. Ji aliyeke din ve, **Erebistana Seûdî** di warê îdeolojî ve ferq û cudahiyeke bingehîn tevî Komara Îslamî ya Îranê heye û weke dewleteke Sunî meseb hez ji nav çavê Îrana Şîî meseb ya tundrew û binajo nake û bihêzbûna wî welatî û çekdarbûn bi çeka Etomî, bi gefeke mezin bo ser ewlehî û pêşeroja desthilata xwe di herêmê de dizane. Li gor vê şiroveyê, eyan dibe ku Rojavayî, tu arîşe û pirsgirêkekê li peydakirina alternatîvekê li cihê Îranê ji bo dabînkirina bazarên xwe yên petrolê nabînin. Lewra dûr nine ku di qonaxên dûrtir de, pêşî ji firotina petrola Îranê bigirin. Gaveke wiha, bêguman bandoreke gelek xirab dê li ser aboriya Îranê hebe, ku her weke îşare pê hate kirin, bi firotina neftê piştrast û girêdayî ye. Di encama ragirtina firotina nefta Îranê de, aboriya wî welatî hêdî hêdî jar û lawaz dibe, gav bi gav ji liv û hêzê dikeve û aqibet tevî herifîn û hiloşînê berbirû dibe. Bi vî awayî têkçûn û hiloşîna bingeha aboriya Îranê ji encamên herî neyînî yên hisarên li ser firotina nefta Îranê tên hesibandin.

**Bandora derpêça aborî li ser jordeçûna aboriyê di Îranê de**

Jordeçûn û bihêzbûna aboriyê di her welatekê de pêkhatiye ji jordeçûna nirxa berhem û xizmetkirinê di wî welatî de li gor asta berhem û xizmetkirinan di sal yan heyamê berê de. Jordeçûna bilez a aboriyê di her welatekê de pêwendî bi hinek fakteran heye ku ya herî girîng zêdebûna bilez a sermayedanîna navxweyî û derve ye, pêşketina teknolojiyê û hebûna hêza çalak, kêrhatî, lêzan, şareza û di encamê de geşekirina berçav a şandiyê ye ku erêniya dilxoşker li ser jiyan û borandina wan didanê. Lê merc û şerta bicîhatina vê armanca mirovî, ewa dibe ku ew dahata serane ji aliyê hikûmeteke berpirsiyar ve û bi awayeke dadperwerane bi ser akinciyên wî welatî de were parvekirinê. Berevajî vê yekê, tirsa vê çendê di holê de ye ku dahata bidestvehatî ji jordeçûn û bihêzbûna aboriyê, ji aliyê taqima desthilatdar ve dest bi ser

www.arsivakurd.org

de were girtin û li cihê ronahîkirina çirayê destkurt û xizanan, dîwanxaneya tejî ji naz û neemet a desthilatdarên bixemilîne. Encama vê kiryara şaş gelek rohn e, ew jî eva ye ku navbera dewlemend û xizanan roj li pey rojê dê zêdetir be. Bi awayekî din, dewlemend dewlemendtir, xizan û destkurt jî dê xizantir û birçîtir bibin.

Nebûna sîstemeke berpirs û edaletxwaz di Îranê de, rê ji vê çendê re xweş kiriye ku ji bilî vê çendê ku fasîleya navbera tekekesan weke tak, belku heta navbeyna neteweyên bindest û neteweya desthilatdar zêdetir be û nikare tevî yek werin nirxandinê. Lênihêrînek kurt li ser rewşa jiyana gelê Kurd li Kurdistana bin sîbera reş a Komara Îslamî ya Îranê de, vê rastiyê ji me re dide kifşê ku digel şer û kawilkirinên Komara Îslamî, ev beşa welat cihek di bernameyên vejandina aborî û avadankirina dewletê de nebûye û nine. Nirxandineke kurt û serpê dide selimandin ku Kurdistan di paremayiyê de maye, aboriya wê jordeçûn bi xwe ve nedîtiye û di seneetê de pêş neketiye. Hejmara karxaneyên wê renge bi tiliyên dest werin hejmartin. Kedkarê Kurd ji bo dabînkirina debara jiyana xwe û malbatên xwe neçar in rû li bajarên dûr ên Îranê bikin. Ev rewşa nebaş û nexwestî bi xwe nehatiye holê, belku sedemên taybet bi xwe hene.

Ji hemûyan re eyan û eşkere ye ku gelê Kurdistanê, gelek azadîxwaz û şoreşvan in. Xelkeke in ku bi kiryar dane selimandinê ku heke hewce be dê canê xwe jî ji dest bidin, lê stûxwarê dujmin nabin, bona vê çendê ku kesayetiya neteweyî ya wan hatibe parastin, hazir in dest ji jiyana xwe jî berdin. Ev azadîxwazî û şoreşvaniya gelê Kurd desthilatdarên dîktator han daye ku ji bo jinavbirina wê hizra şoreşgerane û însanî a wan, bîr ji awayên cuda cuda bona ji holê rakirina wan ya hovane û nemirovane bikin. Eger çi rejîma Îranê ji bo serkutkirina tevgera azadîxwazane a xelkê xebatkar yê Kurdistanê her ji destpêka serkevtina şoreşa gelên Îranê, dest avête serkutkirina leşkerî û Kurdistan bi giştî mîlîtarîze kir, lê bi vê çendê jî têr nebûye û gelek metodên nemirovane ên din bi kar aniye ku yek ji wan mifahwergirtin ji çeka aborî bû. Em dikarin bibêjin ku rejîmê Kurdistan di warê aborî de dorpêç kir, dorpêç bi vê wateyê ku Kurdistan di warê terxankirina bûdceya jêhatî bêpar kir. Bi vê sedemê ve delîve û derfeta jêhatî ji bo pêşxistina seneet û aborî di Kurdistanê de ji nav bir. Di encam de kargeh û karxaneyên nûjen ku hewcehiya pêşketin û jordeçûna aborî ne, di Kurdistanê de ji aliyê hikûmeta Tehranê ve nehatin damezrandin û nahên avakirin. Em dikarin bibêjin pêşxistin û geşandina aborî û pîşeya Kurdistanê bi pestî ji aliyê karbidestên rejîmê ve nehatiye liberçavgirtin.

Lê bi vî halî jî, her weke berê me îşare pê kir, jordeçûna aborî heke bi awayeke berpirsiyarane û dadperwerane mifah jê were standin, dibe sedema bextewerî û asûdebûna akinciyên welat. Ji bilî vana, di welatekê de ku jordeçûna aborî bi xwe ve dibîne, asta daxwazên akinicyan, bona xerca zêdetir ber bi jor diçe ku her li cî de bandora rasterast li ser karxaneyên berhemçêker didanê û wan han dide ku tiştên zêdetir berhem bînin, bona vê çendê ku çêtir û jêhatîtir bersiva daxwaziyên sûkê bidin û her di vê demê de qazanceke zêdetir bi destê wan bikeve. Ji bo ku di karê xwe de serkevtinê bi dest bînin, divêt hêza kar a zêdetir bi dest bixin û kedkarên zêdetir li ser kar dabimezrînin. Bi vî awayî, him qazanca akinciyan, him jî qazanca hêza kar, him qazancê berhemîneran û him jî qazanca dewletê di yek demê de tê misogerkirin.

**Lê qazanca dewletê kîjan e?**

Yek ji wan arîşe û pirsgirêkên ku gelek caran hemberî dewletan dibe, kêmbûna bûdceya giştî a welat e. Bi wateyeke din, dewletê karîna dabînkirina xerca dezgeh û saziyên xwe, nexweşxane, dermangehên dewletî, xwendingeh û zanîngehan nine. Lê demekê ku bihêzbûna aborî ber bi jordeçûnê de be û di encam de xerca giştî a xelkê jorde biçe, dewlet bi hêsanî dikare vê valahiyê ku kêmiya bûdceyê ye, bi pereyên bac yan bi wateyeke din maliyatê tejî bike.

Xaleke din ku derheq jordeçûna aboriyê hewce ye îşare were kirin, ewa ye ku bihêzbûna aborî û baştirbûna bazar bi giştî, rewş, zirûf û hitbarê li cem sermayedanînên navxwe û derve çê dike û dibe handereke pir baş bona berhemanîna baştir ku di cihê xwe de pêvajoya jordeçûnê bileztir dike û lez û hêzeke zêdetir dide pêşxistina welat.

Helbet di pêvajoya bihêzbûna aboriyê de hin caran pufdan(awsan) a diravî serî hildide, ku aborîzanên pispor û şareza çek û alavên taybet ji bo derbazbûn ji vê awsanê pufdanê heye ku di vê nivîsarê de cî nabe.

Ev fakterên ku bi kurtî li jor qala wna hate kirin, yanî sermayedanîna navxweyî û derve, hêza kar ya kêrhatî û bi ezmûn û pêşketina teknolojiya nûjen, merc û şertên jordeçûna aboriyê ne. Lê pêşmercên gihîştin bi vê jordeçûnê jî, ji aliyekê bûna ewlehiyê di welat de û ji aliyeke din jî bawerî û berdewamiya vê ewlehiyê ye. Li ser vê bingehê, sepandina dorpêça aborî, heke rasterast jî rê ji sermayedanîn di Îranê de negire, ewa dorpêç bi xwe ewlehiya welat têk dide û bêbawerî bi pêşerojê li cem sermayedaran çê dike. Di encamê de, ji bilî vê çendê ku berhemanîna derveyî di Îranê de nahê cîbicîkirin, belku dûr nine ku sermayedarên navxwe jî bona parastina heyîna xwe rû li derve bikin. Serbarê van bandorên nerênî ên dorpêça aborî, egera vê çendê jî di holê de ye ku bankên cîhanî ji dana wam û deynan ji dewleta Komara Îslamî re xwe biparêzin ku ewa jî pêvajoya têkçûna bingeha aboriya Îranê bileztir dike.

**Bêkariya rû li zêdebûnê û giraniya bêhêzker**

Pile û asta bêkarî di Îranê de bi qasekê li jor de ye ku heta karbidestên wî welatî jî nikarin haşayê jê bikin. Ew aste di Kurdistanê de 25 ji sedê tê texmînkirinê.

Nizmbûna jordeçûna aborî sedemeke girîng e li nizmbûn û qelsbûna asta abêkariyê di Îranê de. Geşekirina nifûs û tejîbûna dezgeh û saziyên ser bi dewletê ji karmend û şêwirdaran ji sedemên din yên bêkarî di wî welatî de tên hesibandinê. Li nirxandin tevî destpêka şoreşa gelên Îranê, hejmara akinciyên vî welatî qatan zêdetir bûye ku bi wateya du qatbûna hêza kar di wî welatî de ye. Ji aliyeke din, di nav dezgeh û saziyên dewletî de, ciheke vala nahê dîtin ku bikare hêza kar û nû tê de were cîbicîkirin.

Li gor serhejmariyan, hejmara şêwirmendên dewletî li destpêka serketina şoreşa gelên Îranê, 550 hezar bû. Piştî dawîhatina şerê heşt salî yê di navbera Îraq û Îranê di sala 1988'an de, hejmareke zaf ji xelkê bêkar ji çeperên şer re vegeriyane nav mal û halê xwe. Ew kesên ku hetanî wê demê tenê di warekê de şarezayî hebûn, ew jî şerkirin bû. Lê şer nemabû, divêt hikûmetê rêçareyek ji wan re bidîta. Lê çi rêyek ji wê rêyê hêsantir ku ew xelkê zaf di dezgeh û saziyên dewletî de dabimezrînin? Hikûmetê ew kare kir, lê bêy vê çendê ku ji encamên wê yên cihê tirsê ên vê gava lênezanane bifikire. Niha bi nirxandinek tevî destpêka şoreşê, hejmara şêwirmendên dewletê li serweyî du milyon kesan e. Bûna wê hejmara zaf di nav dezgehên dewletê de, ji aliyek xercên dewletê ber bi jordeçûnê biriye, ji aliyeke din ve jî valahiyek di nav wan saziyan de ji nifşa nû û tazepêgihîştî re nehêlaye ku hejmarek ji bêkarên welat di xwe de cî bike.

Bêkariya zaf bandorên gelek xirab li pey xwe bi cî hêlane. Ev bûyerê mejî han didan ku rêya derve bigirine ber xwe û karîn û şiyana xwe bixin xizmeta welatên din. Ew cure kesane jî, bi taybet nifşa ciwan ku derfeta helatin ji vê zirûfa nexwestî a zal bi ser Îranê de nebûne, berbi nexweşiyên civakî bi taybet madeyên hişber kişandiye.

Di rewşeke wiha de, sepandina cezayên aborî ji bilî zêdebûna hejmara bêkariyê û tûşbûn bi nexweşiyên civakî, tişteke din jê nahê çavnihêrîkirin.

**Encam**

Her weke em dibînin Îran xwediyê aboriyeke hejok û lawaz e, petrol bingeha sereke ya vê aboriyê pêk tîne. Li nirxandin tevî jordeçûna diravî de ku bi wateya zêdebûna buhaya dirav û nizmbûna hêza kar dirav di sûkê de ye, jordeçûna aboriyê gelek li jêr de ye.

Jordeçûna aborî %5 e, di demekê de ku jordeçûna diravî, 30 hetanî 40 ji sedê li jordeçûn û nizmbûnê de ye.

Aboriyek ku xwediyê van taybetmendiyan be, rohn û eşkere ye ku li hember givaş û zextên cîhanî çavnihêrê pêşerojeke rohn nabe. Metirsiya hisarên aborî demekê digihîje gopitkê, ku berlêgirtin ji hinartina petrolê bo derve li xwe de digire. Gavek ku carê zû ye, were çavnihêrîkirin.

dorpêçkirinên aborî di dirêjdem de bi zirarê xelkê sivîl xilas dibe. Qursahiya dorpêçên aborî berî her kesekê dikeve ser milê gelên xizan û destkurt ên Îranê. Di vê navberê de, xelkê Kurdistanê zêdetir ji hemû kesekê zirarê dibînin. Bi taybet ku beşeke berçav ji xelkê Kurdistanê tevî bêkariyê berbirû ne.

Erkê hêzên siyasî yên Kurdistanî, bi taybet PDK Îranê, ku zêdetir ji hemûyan di nava dilê xelkê Kurdistanê de cî heye, ewa ye ku her ji niha ve di hizra bandorên dorpêça aborî yên Neteweyên Yekbûyî li ser xelkê Kurdistanê de bin, bila her ji niha ve bîr ji rêçareyeke baş û jêhatî ji bo kêmkirina wî barê giran û ne çavnihêrkirî bikin ku li egera dirêjheyambûna cezayên aborî yên sepandî bi ser Îranê de, hemberî xelkê Kurdistanê, bi taybet malbatên xizan û destkurt be.

**Çavkanî: "gooya.com" – "SKL.se" – "wikipedia" – "BBC" – "peykarandish"**

www.arsivakurd.org

# YXDK Îranê, Roja 12'ê Banemerê Weke Roja Xwendekarên Kurd, Ragihand

**Şikandina Tarîtiyê Rêba Xwendekarên Azadîxwaz Ên Kurd e**


Xebata ber bi pêş a hertim di geşekirinê ya demokrasîxwazî û mafxwaziya gelên bindest ên Îrana di bin desthilata zorxwazên Faşîst de, di qonaxeke hestiyar a dîrokî de derbaz dibe. Hevdem û aheng tevî gotara zal a cîhana nû û eniya rû bi berfirehtirbûnê ya demokrasiyê de û di bin bandora cîhanîbûna buha û pirensîpên mirovtewerane û azadîxwazan de û di berberê hiloşîna sînorên di navbera civakên cuda cuda yên mirovahiyê de, Rojhilata Navîn û welatê Îranê jî mijûlê hejandin û pêtên agirê daxwazan serkutkirî yên tex û qatên cur bi cur ên civakê geş dibin û birîskên wan îlankerê haydarbûna vê borkanê ne û dibêjin ku di wan nêzîkane de dê werin helkirin û desthilata paşverû ya Melayan dê ji bin lehî û guriya agir de veşêrin û bispêrin dîrokê.

Xebata rewa û mafxwaz a gelên bindest ên di çarçoveya Îranê de, çalakî û tevgerên civakî yên jinan, ciwanan, xwendekaran, kedkaran, mamostayan û hemû çîn û texên civaka rengîn a Îranê, bi awayeke bê nimûne geşe kiriye û berfirehtir bûye.

Di roja 2'ê Banemera 1386(22.04.2007)'an de, em şahîdê xurtbûna tevgera qatên cur bi cur ên civakê û yek ji wan Bizava Xwendekarî ne ku 27 salan berî niha di rojekî wiha de rejîma kevneperest û tirsonek ji haydariya gel, bi êrîşkirinê bi ser zanîngehê û serkutkirina hov a zanîngeh û mamosta û xwendekarên wê û dest bi ser de girtina xwendin û hînbûnê, hez dikir ku ciwanan û hêviyên pêşeroja welat bi hizra xasmanî ya xwe perwerde bike û di mejiyê her takekesekî/ê wî welatî de Melayek(Welayeta Feqîhek) amade be û rêberiya jiyana wan bike. Lê em dibînin ku piştî 27 salan, Wezîrê tawan û cinayetên rejîmê Muhsinî Ejêyî, Bizava Xwendekarî û xwendekarên ku rejîm wiha dihesibîne ku li gorî perwerdehiya Komara Îslamî elimandine, dijminê rejîmê û hilweşînê desthilata "Welayeta Feqîh" ji cîhanê re dide nasandin.

Tevgera pêkhateşikên a xwendekarî bi domandina rêya pir hevraz û nişîv a azadî û dadxwaziya xwe, bi tecrûbeya çendîn sale û derbazbûn ji qonaxên cur bi cur ên geşekirin û dijwariyê de, niha bi destpêkirina hevahengiyê tevî tevgerên civakî yên din de di rê de ye û hêvîdar e bi pêşerojê û rikeberiyê tevî rejîma reşçalan dike.

Di vê rewşê de û di qonaxa hatin di halê guherîn û serhildanê de, xwendekarên azadîxwaz ên Kurd jî bi wergirtina tecrûbeyan ji dîrokê û domandina xebata rizgarîxwazane û hewildanê ji bo selimandina nasnameya xasmanî ya Bizava Xwendekarî ya Kurd, gavên bilindtir, hişyarane û biwêrane davêjin û hevdeng û dirêjîderê xebata rewa ya neteweyî – demokratîk a gelê xwe, tekoşîna xwendekarî ya Kurd di pêxema gihîştin bi azadî û şikandina normên paşketî yên civakê û desthilatê û avakirina pêşerojekî geştir, pêşde dibin.


Şehîd Simaîl Şerîfzade

Meha Banemerê, meha serhildana gulûlkesorên niştîmanê, di germahiya hewl û tekoşîna demokrasî, maf û nûxwaziya xwendekarên azadîxwaz ên Kurd de, beşeke dîroka pir ji serwerî û şanaziya xebata gelê Kurd û pêşengên xebata xwendekarên Kurd di pêxema selimandin û sepandina hebûna xwe li ser erdê dagirkirî ji aliyê tarîtiyê ve, bibîr tînin. Di nêzîkahiya 40 saliya hemaseya xebata çekdarî ya 46 – 47'an a Rojî de, di meha Banemerê û di vê qonaxa Bizava Xwendekarî ya Kurd de, bibîranîna **Şehîd Simayîl Şerîfzade**, rêzgirtin ji vê xebata pîroz û hevdem fêrbûn e ji vê waneyê ku ji dîrokê gotiye. Şehîd Simayîl Şerîfzade, ew xwendekarê azadîxwaz ê Kurd bû ku di şeva tarî ya desthilata serberedayî ya Paşatiyê de, bi çûna nava refên azadîxwazên gelê xwe û Pêşmergeyên PDK Îranê de, mil bi milê hevçeperên xwe, bi qirmîna çekên xwe yên azadîxwaziyê, bêdengî şikandin, berdan tarîtiyê û rêya maf û azadîxwaziyê ronahî kirin. Şerîfzade, bi şehîdbûna xwe di roja 12.02.1347'an a Rojî de, bû sembol ji xebatkar û xwendekarên azadîxwaz ên Kurd re.

YXDK Îranê, bi nihêrîna xwe ji bo tevgera pêkhateşikên a xwendekarî û erkê dîrokî yê xwendekarên Kurd, şikandina tarîtiyê weke rêbaza xwendekarên azadîxwaz ên Kurd dizane û pêşniyar dike ku xwendekarên rizgarîxwaz ên Kurd roja şehîdbûna xwendekarê xebatkar, Simayîl Şerîfzade, roja 12'ê Banemerê weke **Roja Xwendekarên Kurd** nas bikin û bi vê hincetê gavên bilind ên dîrokî ji bo selimandina nasnameya taybetî ya tevgera xwendekarî ya Kurd, werin avêtin.

Bi rêz û pîroz be bibîranîna Şehîdên rêya azadiya Kurd û Kurdistanê û hemû xwendekarên Şehîd ên rêya azadiyê.

Bi rêz û pîroz be bibîranîna Şehîd Simayîl Şerîfzade, sembola xwendekarên Kurd.

**Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ên Kurdistana Îranê**

**02.02.1386'an a Rojî.**

# Birêz Yaşar Qaya, Seredana Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Kir

Kesayetiyê naskirî û ronakbîrê Kurdistana Bakûr, rêzdar Yaşar Qaya roja çarşem, 26'ê Nîsana 2007'an, seredana Polîtbîroya PDK Îranê kir.

Di hevdîtinekê de tevî Sekreterê Giştî yê PDK Îranê û çend endamên din yên rêberiya partiyê, Yaşar Qaya li ser rewşa siyasî ya Kurd, siyseta Yekîtiya Ewropayê li dor pirsa Kurd, çalakî, xebat û bandora saziyên çandî, kulturî û neteweyî ên Kurd li derveyî welat axivî. Birêz Qaya di gotinên xwe de rola partiyên siyasî ên Kurd di tevgera azadîxwaziyê de baş zanî û di vê derheqê de


Ji aliyê çepê ve, birêz Yaşar Qaya û rêzdar Mistefa Hicrî

tekoşîna PDK Îranê di xebata siyasî, neteweyî û dîplomasiya Kurd li asta navneteweyî de girîng û bibandor hesiband.

Piştre hêja Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, tevî xuyakirina şabûna xwe ji seredana birêz Yaşar Qaya, spas û pêzanîn bona helwesta birayane ya birêz Qaya li ser rewşa Kurdistana Îranê û xebata û tekoşîna PDK Îranê, bal kişande ser guhertinên siyasî ên Rojhilata Navîn û pirsa Kurd bi giştî.

Birêz Mistefa Hicrî di doma gotinên xwe de li ser helwesta siyasî û neteweyî ya PDK Îranê ji bo girîngî û nirxdayîn bi xebat û çalakiya kesayetiyên naskirî û saziyên çandî û neteweyî ên Kurd – ku armanca wan nasandina bêtir ya pirsgirêka Kurd ji civaka navneteweyî re ye – tekez kir.

## Nûnerê Bokanê Û Wezîrê Vejenê Ya Rejîmê Li Hemberî Hev Derketin

Navenda Nûeyan ya PDK Îranê eşkere kir ku roja 05.02.1386(25.04.2007)'an, di navbera Enwer Hebîbzade, nûnerê bajarê Bokanê di Parlemana Îslamî ya Îranê de û Wezîrê Vejenê yê rejîmê, Perwîz Fatih de, seba bi dawî nehatina projeya bendava "Sîmîne" ya derdora Bokanê, nîqaş derket. Di civîneke roja han a Parlemanê de, nûnerê bajarê Bokanê, Wezîrê Wizê yê rejîmê xiste bin lome û gazindeyan û bi tundî rexne kir. Wezîrê han di hember de eşkere kir ku destpêka pirojeya han yek ji şaşiyên herî mezin ên Wezareta Wizê bûye û bi tu awayekê naxwaze ku ji nû ve bide dest pê kirin û li ser bixebite.

Ji ber razî ebûna nûnerê Bokanê ji bersiva Wezîr, dosye çû komîsyona taybet da ku bikeve ber lêkolînên zêdetir.

www.arsivakurdi.org

**Daxuyaniya Çapemeniyê:**

## PDK Îranê Tenê Li Hember Naveroka Malperên Fermî Ên Xwe Berpirsiyar E

Di heyamê salên derbazbûyî de gelek malper û nivîsar li dij, alîgirî yan bi navê tagirî ji PDK Îranê gotar û nivîsar belav kirine, ku naveroka beşeke berbiçav ya wan malperan şik û gumanê dixe ser dilsoziya wan ji PDK Îranê re.

Eva jî yê bûye hêcetek ku hetanî hinek alî û neyarên PDK Îranê naveroka wan nivîsaran bikin hêvinê piropagendeyên xwe li dijî partiyê.

PDK Îranê li derheq ew pirsên ku hewcehî bi helwestgirtinê bin, bi eşkere û ronî siyaset û rayên xwe di malperên fermî ên xwe de belav dike û li hember naveroka wan berpirsiyar e.

Di Pilînom(civîn) a heftem a Komîteya Navendî ya PDK Îranê de, helwesta partiyê li derheq nivîsarên bêxwedî hatiye ragihandin. Di vê derheqê de em dubare dikin ku partiya me tenê xwe li hember kakil û naveroka belavokên fermî ên xwe ji rêya malpera navendî(www.kurdistanmedia.com) û malpera nûneriya PDK Îranê li derveyî welat(www.pdki.org) bi berpirs dizane û em xwe li hember naverok, babet û siyasetên malperên din û şêwaza ragihandina wan berpirs nazanin.

**Komîteya kar û barên PDK Îranê li derveyî welat**
**Beşa Ragihandinê – Parîs**
**25.04.2007**

---

## Girevigirtina Rêzokî Ya Mamostayan Di Meha Banemerê Dê Zêdetir Xurt Bibe

Li gorî rapora Navenda Nûçeyan ya PDK Îranê, qirar e Mamostayên Parêzgeha Kurdistanê (yek ji 4 parêzgehên Kurdistana Îranê ku Navenda wê bajarê Sine ye) di doma girevên çend mehên borî de, di rojên 2 û 8'ê Banamerê(22 û 28'ê Nîsanê) girevê li dar bixin û her wiha biryar e di roja 02.05.2007'an de, tev Mamostayên vê Parêzgehê li hember Îdareya Giştî ya Perwerde û Fêrkirinê a Parêzgeha Kuurdistanê gireveke mezin pêk bînin.

Her di vê derheqê de û bi armanca îsrara zêdetir li ser cîbicîkirina daxwaziyên xwe ku heta niha ji aliyê rejîmê ve bêbal maye, Mamostayên seranserê Îranê dixwazin di roja 18'ê Banemerê (8'ê Masyisa 2007)'an, civîneke mezin û berfireh li hember Meclîsa Şêwra Îslamî ya Îranê li bajarê Tehranê birêve bibin.

Mamostayên Kurdistanê jî di doma nîşandayîna nerazîbûnên xwe de, rojên 26 û 27'ê Banemerê(16 û 17'ê Nîsanê) neçûn bo ser kilasên dersê û bi vî awayî bûne sebebê daxistina hemû xwendingehên vî bajarî. Ev gireva nerazîbûnê di çaxekê de birêve çûye ku "Heraset" (Parêzvanî) a Îdareya Perwerde û Hînkirinê ya Parêzgeha Kirmaşanê, roja 11.04.2007'an, di civîneke de ji bo berpirsiyarên xwendingehan, ji wan xwestibû ku ew mamostayên ku naçin bo ser kilasên dersê, bi wan binasînin, heya ji rêya şandina dosyayên wan ji bo Îdareya Ewlekariyê, cezayê pêwîst ji wan re were diyarîkirinê.

# Gerek Kurt Di Dîrokê De ...

**Amadekar: Nûredîn Sofîzade**

**17.04.1993:** Turgot Ozal, Serok Komarê berê yê Turkiyê bi terzekî cihê şikê koça dawiyê kir. Wî dixwast pirsa gelê Kurd ji rêya danûstandinê bihê çareserkirinê. Lewra şika hindê hebû ku Kemalîstên Turk ên şovenîst ew dermanxwarî kiribin!

**18.04.1980:** Bo cara dawiyê, Komîteya Navendî ya PDK Îranê nameyeke servekirî ji bo Xomeynî hinart û jê xwast ku 6 madeyên daxwazên gelê Kurd qebûl bike û fermana vekişyana hêzên rejîmê ji Kurdistanê bide, ku ev jî bê bersiv ma.

**18.04.1986: Mamosta Hêmin**, helbestvan û rewşenbîrê Kurd koça dawiyê kir. Ji aliyê PDK Îranê ve ew wekî **Helbestvanê Neteweyî** hatibû naskirinê. Wî çendîn pirtûkên helbestan nivîsandine.

**19.04.1991:** Piştî şerê Kendavê û vekişyana hêzên Arteşa Îraqê li Kuweytê û êrîşa rejîma Beesa Îraqê bo ser Kurdistanê ji aliyê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, hêla 36 dereca ya qedexe bona firînê ji bo rejîma Îraqê hate diyarîkirinê ku Kurdistan digirt û ji aliyê balafirên Amerîkayî ve dihate parastin.

**19.04.1993:** Topbarana binkeya Deftera Siyasî a PDK Îranê û gundên derdorê ji aliyê hêzên Komara Îslamî a Îranê ve ku şev û rojekê dom kir. Di vê êrîşê de bi dehan kesên bê berevan şehîd bûn.

**19.04.2005:** Avabûna Rêxistina Parastina Mafê Mirovan li Kurdistanê bi serokatiya **Mihemed Sidîq Kebûdvend** hate ragihandin. PDK Îranê ev gave bi kareke erênî hesiband.

**20.04.1979:** Teqekirin ji mîtînga PDK Îranê li bajarê Nexedê de û qewimîna şerê di navbera Kurd û Azeriyan bi pîlana rejîma Komara Îslamî û kirêgirtiyên Wê wek Mela Hesenî.

**20.04.2004:** Perde hildana li ser lewha bibîranîna şehîdên Mîkonosê bi pişikdariya pitir ji 1000 kes ji Kurd û Îraniyan li hemberî cihê bûyerê li bajarê Berlînê ya Almaniyayê. Perde li ser tabloya bibîranîna şehîd Sadiq Şerefkendî û hevalên wî ji aliyê xatûna **Monîka Teymen** şaredara Lotnborgê ve hate hildan.

**22.04.1898:** Yekemîn hejmara rojnameya Kurdî a Kurdistan ji aliyê Miqdad midhet Bedirxan ve li Qahirê hate çap û belav kirin.

**22.04.2006:** 3 salan piştî ji nav çûna rejîma Bees a Îraqê, dewleta fermî ji aliyê xelkê Îraqê ve hate hilbijartin û rêzdar **Celal Talebanî** bû Serok Komarê Îraqa Federal.

**23.04.1946:** Peymana Dostînî û alîkariyê di navbera **Komara Kurdistanê** û **Hikûmeta Neteweyî a Azerbaycanê** de bi serokayetiya **Pêşewa Qazî Mihemed** û **Cefer Pêşewerî** de hate îmzakirin.

**24.04.1980:** Cehda Amerîka ji bona rizgarkirina 52 rehînên xwe yên li bajarê Tehranê ji destê Komara Îslamî, li newala Tebesê de tevî têkçûnê ber bi rû bû.

**25.04.1945:** Kiryara dijî mirovahiyê ya "Holokast"ê ji aliyê Naziyên Faşîst li dijî Cihûyan bi fermana dîktatorê navdar Hîtler, ku bi milyonan Cihû hatin qebûl kirin.

**26.04.1986:** Teqîna Hêzgeha Etomî ya "Çernobêl"ê. Di vê bûyerê de hezaran kes bûne qurbanî û bandorekî nerênî xiste ser rihberên deverê

**28.04.1951:** Dr. Mihemed Mosediq. Rêberê Eniya Neteweyî bû Serok Wezîrê Îranê.

**28.04.1985:** Cihgirê fermanderê Hêza Beyan, Qasim Mihemedpûr ji aliyê hêzên Komelê ve şehîd bû.

**29.04.1990:** Herifandin û hilgirtina dîwarê Berlînê ku Almanya kiribû du par, Almana Rojhilat û Almana Rojava.

**29.04.1994:** Dewleta Îsraîlê Rêxistina "Azadîbexş" a Felestînê wekî dewleteke otonom pejirand û ragihand ku amade ye pêre gotûbêj bike, ew jî bi givaşa navneteweyî bû.

**30.04.1946:** Di dema desthilatdariya Komara Kurdistanê de, dezgeheke radyoyê ku jê re "Istasiyon" digotin, li Mehabadê de hate damezirandin û bo yekemîn car Pêşewa li ser wê axivî.

**30.04.1953:** Pêkhatina komîteyeke nû bo PDK Îranê li Mehabadê, bona rêxistina endamên partiyê.

**30.04.1985:** PDK Îranê bi derkirina daxuyaniyekê hemû aliyek agehdar kir ku li "şoraya milî moqavemet" (Civata Neteweyî ya Berxwedaniyê ku Mucahidînên Xelqê rêberiya wê dikir)ê de nema û têde derket.

www.arsivakurdi.org

# Vegeriyan Ber Bi Paşverûyiyê

**Hemîd Muxtarî**




Çend rojan berî niha ku biryara birêvebirina gelaleya xebata li dijî "Bed Hicabî" (neparastina lixwekirinê li gor Ola Îslamê), hate dan, hêzên Întizamî ên Komara Îslamî ya Îranê bona birêvebirina vê biryarê bi amadebûna xwe li ser şeqam, meydan û cihên hatin û çûnê de, dest bi êşandin û girtina xelkê dikin. Li go ragihandin û çapemeniyên Îranê heya niha pitir ji hezaran kes ji jin û keçên Îranê li ser rê û cihên giştî seba lixwekirina kincên ku bi raya desthilatdarên rejîmê binyat û yasayên Îslamê bin pê dike, ji aliyê hêzên rejîmê ve gef ji wan hatiye xwarin ku êdî bi vî terzî nehêne sûk û bazarê. Ger kesek li hember biryara han berxwedaniyê bike yan binpê bike û serê xwe li hember daxwazên hêzên rejîmê neçemîne, dê ber bi binke û navendên leşkerî werin şandin û bihên girtin. Di vê derheqê de li rojên borî, bi sedan kes hatine girtinê û piştî wergirtina soza nivîskî ji aliyê rejîmê ve û guherîna kincên xwe, hatine azadkirin.

Di rastî de rejîma Komara Îslamî a Îranê li mêjdem e ku dixwaze civaka Îranê ber bi paş ve bibe. Civakek ku jinan mafê hatin û çûnê têde tunebe, di mal de bimîne û ger zaf hewce be ku di malê de were derê, divêt di kêleka dîwaran de ev jî bi lezî derbaz be. Nabe tu kes rûçikê wan bibîne yan dengê wan guhdarî bike. Nabe mêr mêzeyî jinê bike û heke carekê mêze kir, bo kereta duyan divêt di dema derbazbûn li hember jinan de, serê xwe nevî (nişîv) bike.

Nabe mêr tevî jinan biaxivin û heta silavê ji wan bikin yan wan bo xwarin û vexwarinê gazî bikin. Divêt jin bo miriyên xwe bigirîn, li gor ramana kevneperestan piraniya jinan cehnemî ne û ... ku pitir hikûmeta Talîban di Efxanistanê de xwediyê wan ramanên kevn û şaş bû. Lê aqibet û çarenivîsa wê bû çi?

Diyare ev gelaleye yekê nine û ya dawî jî nabe. Ger di bîra we xwandevanên hêja de be, Meclisa Şêwra Îslamî ya Îranê heyamekê berî niha gelaleyek din jî ku dixwast rê û şeqamên mêr û jinan ji hev cuda bikin, anî ber bas, lê bi rastî karî bi serê xelkê de bide sepandin?

Rejîma Îranê pitir ji 28 salan e ku cehdê dike ew raman û hizrên xwe ên paremayî bi ser xelkê de bide qebûlkirin, herçend ku di destpêka desthilatdariya xwe de karî heya astekê serkeve, lê di serdemê niha de ku di cîhanê de guhartinên zaf pêk hatine, rûçikê rastîn yê rejîmê bo xelkê eşkere bûye û cîhan roj bi roj zêdetir ber bi cihgirbûna demokrasiyê diçe. Herwiha hişyarbûna raya giştî a cîhanê û berfirehbûna xebata neteweyên Îranê û xelwebûna rejîmê di astê navneteweyî de û zaf faktên din dest dane destê hev û rejîma Îranê xistiye bin zext û givaşan.

Îro rojê xelkê Îranê bi giştî tevî mafên xwe nasyar bûne ku eva gaveke erênî ye bona serkevtina wan. Xelkê Îranê daxwaza pêkhatina civakeke azad, demokrat û sivîl dikin.

Dewletek vekirî û berpirs li ser kar be, rêz ji bo mafên siyasî, civakî û wd... were danîn û civakek demokratîk ku yek ji mercên herî sereke ên civakeke serdem û îroyîn e pêk bihê.

Bila em lêbinêrin ka gelo rejîma Îranê xwediyê tu yek ji wan taybetmendiyên navhatî ye?

Sîstemek kevneperest û hişk ku qet nekariye û amade nebûye biyava taybet û giştî ya xelkê ku yek ji hewcehiyên herî sereke di pêkanîna civakeke demokratîk de ye, binase û rêz û hurmetê ji bo serxwebûna wan danê, çawa dikare xelkî be?!

Rejîmek ku heta di jiyana asayî ya xelkê de desttêwerdanê dike, heya terzê lixwekirin, xwarin û vexwarinê bo xelkê diyarî dike, tu rêz û hurmetekê bo azadiya raderbirînê, hilbijartina hizr û ramanan, azadiya rexnegirtinê û jiyana azad û serbixwe a xelkê nagire, çawa dikare demokrat be?!

Rejîmek ku di yasaya bingehîn ya wê de bi dehan esl û madeyên ferq û cudahîdanînên olî, nejadî, zayendî, ramanî, çînayetî û ... tên dîtin, çawa sîstemeke xelkî ye?!

Divê were gotin ku di civakekê de ku biyava taybetî – giştî û çarçoveya desthilatdariya dewletê ji hev nehê cudakirinê, nikare ber bi demokrasiyê here.

Bi kurtî, di çarçoveya desthilatdariya rejîma Îslamî a Îranê de ku ol û dewlet tevlî hev kirine û li gor qazanc û berjewendiyên xwe Îslamê şirove dikin, nabe me tu hêviyek bona rêzgirtin ji mafê mirovan di vê çarçoveyê de hebe û bo gihîştin bi vê armancê tenê rêyek heye, ew jî xebat ji bo pêkanîna civakeke vekirî, serbest û demokratîk e.

# Pehlîwanên Temenbiçûk 3 Xelat Wergirtin

Roja 14.04.2007'an, li bajarê Karlskoga li Swêdê Pêşbirka Karateyê bi navê **Nordic Cup**ê de ji 4 welatan 31 Yane (kulûb) bi 195 yarîzan beşdar bûn.

Hemû yarîzan dikarîbûn di 2 cureyê karateyê de beşdarî bikirana.

1 - Kata

2 - Fighting

Ji wan yarîzana 2 kur û keçek kurd jî hebû. Hanna Kakavendî (8 salî) di beşê Katayê de xelata yekem wergirt. Piştre dora kekê wê Mîdya Kakavendî (10 salî) hat û wî jî xelata yekem wergirt.

Di beşê Fightingê de Dîyar Aliş (10 salî) xelata sêyem û herweha Mîdya di grûpeke din de xelata yekem wergirtin.

Her 3 yarîzanên kurd, rûniştvanên bajarê Eskilstuna ne û di Yaneya Karate Center Goju Kai de karateyê dikin.



**Nordic Cup** ji sale carekê pêk tê û eva cara yekem bû ku Hanna, Mîdya û Dîyar beşdariyê dikin.

www.arsivakurd.org

### Jinên Bê Dahat Di Îranê De, Hilbijartin Di Navbera

# Belengazî Û Mirina Zarokan Yan Qaçaxa Madeyên Sirker

**Nahîd Riyazî**
**Wergerandin: Hemîd Muxtarî**

Seba xizanî û bêkariya berfireh û nebûna tu hevkariyeke civakî û dewletî ji bo jinan di Îranê de, îro rojê hejmareke zaf ji jinên ku berpirsiyariya xwedîkirina zarokan li stûyê wan e û xwediyê tu çavkaniyeke dahatî ninin, neçar in ku karê qaçax a madeyên bêhişker bikin.

Di rastî de desthilatdarên rejîma Komara Îslamî ku bi xwe sebebkarê hejarî û betalî bêşoliya pareke zaf ji xelkê û bi taybet jin û zarokan di Îranê de ne, heya niha hejmareke zaf ji van jinan di Îranê de bi sûçê kirîn û firotina madeyên sirker bi darvekirin û cezayên giran hatine mehkûmkirinê. Eva di halekê de ye ku bi çendîn keretan hebûna destên desthilatdarên rejîmê di kirîn û firotin û qaçaxa madeyên sirker û diziya diraveke zaf, seba kêşeyên hundirîn ên di navbera wan de, ji aliyê bandên rejîmê bi xwe ve hatine eşkerekirinê. Her cara ku ev dirav tên eşkerekirin, pitir ji sedan milyar tûmen e û gişt dezgehên rejîmê bi wan diravan bi rê ve diçin.

Îro rojê jin û zarok di bin desthilata reş ya Îrana Îslamî de texa herî zêde ya destkurt, hejar û bêkar di vî welatî de ne. Jinên bêkar û bêpar ji her terze hevkariyeke civakî ku di çanda Îslamî de bi jinên bêserperişt (çavdêr) yan jinên ku serperiştiya wan nebaş in, hatine nasîn, di rewşeke herî xirab ya aborî û civakî de ne. Rejîma Îranê bi zêdekirina nasnavê "bêserperişt"ê bo jinan, di rastî de dixwaze ji aliyekê ve li ser çanda mêrserdestiya Îslamî ya xwe û li ser bêbihabûn û girêdayîbûna jinan bi mêran ve pêdagir be û ji aliyekî din ve berpirsiyarbûna xwe li hember hevwelatiyên civakê bixe stûyê jinan û serperiştiya wan anku mêr û xizm û kes û karên wan.

Îro rojê çavkaniya dahata parek ji jinên ku berpirsyariya xwedîkirina zarokan li stûyê wan e, tenê xwefirotin (zîna) yan firotina madeyên bêhişker yan her du ne. Eva di halekê de ye ku serwet û saman û dahata desthilatdarên Îslamî di Îranê de li dirêjahiya pitir ji du dehsalan ji temenê desthilatdariya wan bi ser xelkê de, pir zêde bûye.

**Nirxandinek:**



Jinên ku di Îranê de seba xizanî û belengaziyê û li rûyê neçariyê ve dest bi xwefirotin û firotina madeyên sirker didin, neçar in bona bidestveanîna bijîva jiyana xwe û zarokên xwe, her terze daxwaz û şert û mercekê ku ji aliyê bandên qaçax yan kiryarên cendekê wan bi wan re tê kirin, qebûl bikin. Ger di vê derheqê de ji wan re bûyerek derkeve holê, tu binyat û yasayek hevkariya wan nake. Ne tenê eva belku ger ev jinên han werin girtinê, dê tevî cezayên şelaq lêdan, darvekirin û kevirbaranê berbirû bin. Eva ku çima jin neçar bi kirîn û firotina madeyên bêhişker dibin, tu kes berpirsiyarê xizanî û desttengiya wan û zarokên wan e û çima tu sazî û binyatek hevkariya wan jinên ku berpirsiyariya xwedîkirina zarokên wan li stûyê wan e û xwediyê tu kar û dahatekê ninin, nake. Bêşik eva tenê karê hikûmetekê ye ku sebebkarê xizanî, belengazî, bêkarî, cezayên hovane, kevirbaran, daliqandinê û hwd ... ji bo xelk û zarokên civakê pêk anîne. Ev rewşa di civakên ku têde heta gelek bi kêmî rêzê ji mafê mirovan digirin û jin û zarok xwediyê mafekê ne, tevî rewşa jinên Îranê farq û cudahiyeke zaf heye. Di Civakên Rojavayê de, jinên ku berpirsiyariya xwedîkirina zarokên xwe li stû girtine, aliyê kêm xwediyê hindek mafan in. Zarok ji aliyê binyatên dewletî ve têne piştevanîkirinê û di demên hewce de ji malbatên wan re hevkariyên civakî tê kirin.

Ger malbata wan bi her hêcetekê nekarin berpirsiyariya xwedîkirina zarokan li stû bigirin, wê demê dê civak berpirsiyariya wan li stû bigire û dê rewşeke mirovî û normal ji bo zarokan pêk bîne. Lê di bin desthilata rejîma Îslamî a Îranê de, binpêkirina mafê mirovan û heta mafê zarokan gihîştiye qaseke pir berfireh û zêde. Bona rizgarbûn ji rewşa han, tenê rêyek maye, ew jî sernixûniya rejîma Komara Îslamî a Îranê ye.

### Di Daxuyaniya Civata Parêzvanên Mafên Mirovan De Hate Xuyakirinê;

## 20 HEYA 25 MİLYON ÎRANÎ Dİ BİN HÊLA BİRÇÎBÛNÊ DE DIJÎN

"Hêj parek berçav ji nifûsa Îranê karîna bidestxistina hewcehiyên herî sereke yên jiyana xwe ninin, nirxandina herî cihê dilxweşiyê vê nifûsê derdora 10 – 11 milyon kes texmîn kirine, lê pispor û karnasên serbixwe hejmara şêniya bin hêla birçîbûnê di navbera 20 heya 25 kesî texmîn kirine".

Ev serhejmariye di daxuyaniyekê de hate xuyakirinê ku Civata Parêzvanên Mafên Mirovan di derheq binpêkirina qanûnên aborî û civakî yên xelkê Îranê hatiye weşandin û rojnameya "Sarmayeh", çapa Tehranê belav kiriye.

Di beşek ji daxuyaniyê de hatiye: "Aliyê kêm qasê çar milyon û 500 hezar kes ji vê nifûsê, yanî milyonek malbatên Îranî, şiyana bidestxistina dahata pêwîst ji bo navbeyngirtin ji hêla xurt ya birçîbûnê ninin û şevan bi zikê birsî dirazên". Di daxuyaniyê de rexne ji bernameyên şaş û çewt ên dewletê di warê aborî hatiye girtin. Rewşa han wisa kiriye ku xizan feqîrtir û zengîn dewlemendtir bibin. Herwiha daxuyanî destnîşan dike ku di mehên borî de, zêdebûn û jordeçûna buha û qîmeta mal û xaniyan qasê 40 ji sedê û di gelek bajarên Îranê li Tehranê heta %200, jiyana 30 ji sedê a nifûs kirêçî – ku piranî ji xizanên kêmdahat ên civakê ne – rastî pirsgirêkên xurt û dijwar kiriye.

Daxuyaniya Civata Parêzvanên Mafên Mirovan qala sedemên xizanî û belengaziyê di cîhanê de dike û dibêje: "Nirxandin li seranserê cîhanê nîşan didin ku sedemên xizanî û belengaziyê di welatên cîhanê de bi ferq in, lê hemû welatên cîhanê di du pirsan de hevbeş in; **Jordebûna xerc û mesrefên leşkerî** û **rizyok û gendeliya îdarî - diravî**".

Daxuyaniya han zêde dike: "Di gelek welatan de, hejmara leşkeran bêtir ji mamosta (fêrkar)yan e. Di Konvansiyona Navneteweyî ya li dijî Xizaniyê a Neteweyên Yekbûyî, pêşdîtin hatiye kirin ku nabe budceya welatan ji budceya tendurustiyê zêdetir be û heke welatekî qerdarê derve be, bi merca kêmkirina budceya leşkerî, qerê wî welatî dê bihê efûkirinê".

Civata Parêzavên Mafên Mirovan di daxuyaniya xwe de tekezê dike: "Îran welatê pêncemîn yê balkêş di warê torîzmê di cîhanê de ye, lê dahata torîstî li Îranê nêzîk bi sifrê ye. Çima xelk li Îranê xizan û hejar in û xizanî ber bi zêdebûnê ve diçe. Ew du sedemên hevbeş yên welatên cîhanê di warê xizaniyê de, ji bo Îranê jî dibin. Xercên zaf yên leşkerî û riziyoka îdarî - diravî di Îranê de jî heye. Heke ev du sedem li her welatekê werin rakirin, xizanî û belengazî heya qasekî zaf dê kêm bibe".

www.arsivakurdi.org

# Birêveçûna 4'emîn Konferansa Bedirxaniyan Bi Hinceta 109'êmîn Salvegera Rojnamevaniya Kurdî




Li gor agehiyên "www.kurdistanmedia.org"ê, roja 20.04.2007'an, bajarê Berlînê şahîdê birêveçûna 4'emîn konferansa Bedirxan, bi beşdariya nûnerê Hikûmeta Herêma Kurdistanê, rojnnamevan, nivîskar û ronakbîrên Kurd bû.

Di rê û resma destpêkirina konferansê de peyamên birêzan Nêçîrvan Barzanî, Serok Wezîr, Kosret Resûl, Cîgirê Serok Herêma Kurdistanê û gotarên xatûna Sînem Bedirxan û Prof. Joyîs Bilû, hatin pêşkêşkirin.

Yekemîn roja konferansê (21.04.2007)'an de, di bin navê "Azadî, Çewisandin û çepameniya Kurdî, di sala 1989 – 2007'an de", bi êşkêşkirina gotara Dr. Mihemd Êhsan, Wezîrê Derve yê Hikûmeta Herêma Kurdistanê, dest pê kir.

Piştre Prof. Emîr Hesenpûr, di bin navê "Peyva çapkirî, endazyariya nasyonalîzm û şiroveya çapemeniya Kurd li serdemê înternetê de", gotarek pêşkêş kir, di pareke din de xatûna Prof. Joyîs Bilû, basek li ser çalakiyên Mîr Kamran Bedirxan, di Fransayê de ji bo nasandina Kurd û pêşdebirina zimanê Kurdî, pêşkêş kir.

Di doma karê konferansê de, ji aliyê Dr. îbrahîm Seydo Aydoxan ve, di bin navê "Celaledîn Bedirxan, Kovara Hawar û Kurdeyatiya nû", basek hate pêşkêşkirin. Di beşa dawiyê ya para yekem a yekemîn roja konferansê de, xatûna Prof. Canêt Kilên, li zanîngeha Akron a Amerîkayê, basek di bin navê "Rojnamevanî li derveyî sînoran de" ku tê de aliyên dîrokî û siyasî yên destpêka rojnamevaniya Kurdî di salên 1989 – 1902'an de şirove kiribûn, hate pêşkêşkirin.

Di para duyem a bernameyên roja yekem a karê konferansê de, dîroka çapameniya Kurd li Kurdistana Bakûr û Turkiyê de, rewşa zimanê Kurd li Turkiyê de û rewşa weşanxane û çapemeniya Kurdî di vî welatî de, ji aliyê birêzan Mihemed Malmîsaj, nivîskar û zimanzan û kardarê projeya mafê mirov a Kurd li Londonê, Ebdula Keskîn, xwediyê weşanxaneya Avesta – xatûna Menîfe Yeldizxan berpirsa weşanxaneya Wate - Samî Tan, ji



Enistîtuya Kurd ya Stenbolê – Koroxlî Kar Aslan, ji Navenda Weşanê ya Doz û Selahedîn Bulut, li pirtûkxaneya Mîdya li Stenbolê, ketin ber bas û dahûrandinê. Her di vê parê de semînarek bi beşdariya hejmarek ji nivîskar û rojnamevanên Kurdistana Başûr û rojnamevan û nivîskarê Kurd li derveyî welat, cîgirê Rêxistina Navneteweyî a Qelem û nûnerên ragihandinên giştî yên Kurdî, birêve çû.

Di roja duyem a karê konferansa Bedirxaniyan de, birêz Mecîd Heqî, sernivîskarê "www. Kurdistanmedia.org"ê li ser rewşa zimanê Kurdî di bin yasayên Komara Îslamî ya Îranê de, basek pêşkêş kir.


Piştre birêz Sîrwan Hacî Husên, sernivîskarê malpera "www.amude.com"ê û endamê Rêxistina Rojnamevanên Bêsînor, di gotarekê de yasaya çapemeniyê li welatê Sûriyê de şirove kir.

Di beşa dawiyê ya karê duyemîn roja Konferansê de, dormêzek li ser rewşa ragihandinê di Kurdistana Başûr de û bi beşdariya xatûna Dr. Andêr Fîşêr, Tahîr û nûnerên rojnameyên Xebat, "Kurdistanî Nwê", "Hawlatî", "Awêne" û nûnerê dezgeha Aras birêve çû.

Di dawiya konferansê de, xatûna Sînem Bedirxan, gotara malbata Bedirxaniyan pêşkêş kir.

# Rojnamevaniya Kurdî Bû 109 Salî

Bi gotina: **"Di dinyayê de çiqas misilman hebin, di gund û bajarên hemiyan de dibistan û rojname hene, bûyerên ku li dinyayê diqewimin, di wan rojnameyan de têne nivîsîn, lê mixabin ku Kurd ji rojnameyan bêpar in û nizanin di dinyayê de çi diqewime, gelek tiştan winda dikin",** di 22'ê Nîsana 1898'an de, bo cara yekemîn Kurd bûn xwdiyê rojnameyê. Navê rojnameyê, **KURDISTAN** bû. Yekemîn rojnameya Kurdî di dîrokê de ji aliyê rewşenbîrê zana û welatparêz, nemir **Miqdad Midhed Bedirxan** ve hate weşandin. Bavê Rojnamevaniya Kurdî bi hêviya mezin ya ji bo agehdarkirina gelê Kurd û pêşveçûnên di cîhanê de, 109 salan beriya niha biryara derkirina rojnameyê bi zimanê





Kurdî dide. Ev gava dîrokî û girîng weke yek ji bidestxistiyên mezin yên neteweya me tê hesibandinê ku rûmet û şanaziya vê vedigere ser ked û xebata malbata Bedirxaniyan.

Pêwîstiya hebûna rojnameyên Kurdî ji 109 salan berî niha ve heya niha her berdewam bûye û dê bibe. Ragihandin û Medyaya Kurdî ya îro xebata xwe li ser hîmê ku Miqdad Bedirxanê nemir daniye, ji demên berê xurtir û berfirehtir didomînin û em dibînin ku îro dengê rewa û berheq yê Kurdan digihîjînin çar hêlên cîhanê. Eva serbarê vê yekê ye ku ji bilî Kurdisatana Azad ya Îraqê li her sê parçeyên din ên Kurdistanê hêj rojnamegeriya Kurdî di zor û zehmetî û rewşên giran û dijwar de – ew jî bi kêmî – rêya pîroz ya Bedirxaniyan didomînin û diweşin, lê berdewam tên qedexekirin û daxistin û rojnamevanên Kurd ên serbixwe û welataparêz tên cezakirin, dikevin ber lêdan, girtin û îşkence û wd.... Vê rewşê xebat û xizmeta rojnamevanên Kurd ji bo rojnamevaniya Kurdî rastî gelek dijwarî û zehmetiyan kiriye.

**Desteya Weşana Agirî**, tevî pîrozkirina 109'emîn salvegera rojnamevaniya Kurdî ji neteweya Kurd, hêviya xurtbûn, pêşdeçûn û nûjenbûna medya û çapemeniya Kurdî wekî hêza çarem ya demokrasiyê di civakê de dike.

# GOTIN

**ADAR JIYAN**
adarjiyan@mynet.com



Konfîçyûsê zana û nemir dibêje: "Heta ku hûn hêza gotinê fêm nekin hûn nikarin hêza mirovan fêm bikin." Dîsa gotineke pêşiyên kurdan heye; tê gotin ku "Goştê mirov nayê xwarin; belê zarê(zimanê) mirov tê xwarin." Rast e. Ne goştekî mirov heye ku mirov bixwe û ne jî eyarekî (çermekî) mirov heye ku mirov li xwe bike. Tiştê ku dimîne zimanê wî/wê ye. Bi vegotineke din, mirov li gorî gotin û vegotina xwe, li gorî zar û zimanê xwe binirx û bênirx dibe.

Gotin, bi serê xwe bêsûc û bêlayan e. Ew, di devê mirov de li nirx û bênirxiyê dadigere. Gotin, bi qasî ku di tu cih û waran de hilneyê mezin û giranbiha û dîsa bi qasî ku li tu cih û waran nedebire, bêwac û bêwate dibe. Yê/ya ku gotinê li zêr dadigerîne jî mirov û yê/ya ku gotinê dike zibil jî dîsa mirov bixwe ye.

Gotin, çendî ku bi serê xwe bêguneh û bêrî be jî, dîsa jî ji hêla xwediyê xwe ve an dibe navgîna xêr û xêrdoşiyên sûdewar an jî dibe alava şer û pevçûnên stemkar. Ji bo wê hewce ye ku em li ser hêza gotinê a erênî hinekî rawestin. Dîsa gotineke pêşiyan heye; tê gotin ku "Gotin heye tim çê dike; gotin heye ser jê dike." Heke em bibin xwediyê gotina ku çê dike, her wiha em ê bibin afirînerê qencî û xêrxwaziyê jî. Na, heke em bibin xwediyê gotina ku ser jê dike, wê çaxê em ê bibin hevparê qesas û kujerên qenciyê jî. Ji bo wê, wekî kuli jor jî hate diyarkirin, gotin, bi qasî ku di tu cih û waran de nedebire, xwedî hêz û bandor e. Bi qasî hemû alav û amrazên şer jî, karîger û çalak e. Û dîsa bi qasî peyvîn û şorindeyên aştiyane çist û lebat e.

Axaftin, vegotin û derbirîna hest, raman, nêrîn, zanîn, şopandin, raçavkirin, daxwaz û pêşniyazên mirov ên ku ji gotinan pêk tê ye. Axaftina watedar bi saya gotinên xweş bandorê li ser guhdêr dike. Mirov gava ku tenê dimîne, çi tiştên ku di hiş û dilê wî/wê de disihire, xwe bi xwe dibêje. Gelek caran bê hemdê xwe eşare û mîmîkan dide dora xwe û bi zimanê cestê(bedenê) diaxive. Car heye gotin bi devê mirov nakeve. Ji ber ku kesekî/e ku pê re biaxive û çend gotinan bike, nîn e. Yanê gotin û axaftin bi pêwendiya dualî ya bi kesên ku li pêşberî hevdû ne, pêk tê. Gotin gotinê vedike. Gotin li axaftinê dihesile. Îcar a baş ew e ku mirov di hêza gotinê de bigihîje û wê di riya başiyê de bi kar bîne.

Hemû têkilî û danûstandinên civakî bi saya gotinê pêk tên. Başî û xerabî bi saya gotinê ji hev cuda dibin. Şer û pevçûn bi gotinê re pêk tên. Aştî û lihevhatin ligel gotinê bi dest dikevin. Kîn û nefrîn, evîn û hezkirin, rûmetdarî û pesindarî di gotinên de veşartî ne. Serberjêrî û şermezarî, xemginî û tengezarî, çewsandin û stemkarî hemû li ser hîmê gotinê ava dibin.

Car heye aşbûn ji gotinê bixêrtir e. Car jî heye gotin ji aşbûnê ferztir dibe. Ji bo wê, divê cihê ku gotin pêwîst be, aşbûn û cihê ku aşbûn pêwîst be jî, gotin xwe ragire. Wekî ku Phtagore dibêje: "An tiştekî nebêje; an jî tiştekî ku ji bêdengiyê(aşbûnê) baştir be, bibêje." Dîsa gotineke pêşiyên tirkan heye, tê gotin ku: "Gotin zîv be; aşbûn zêr e." Dibe ku hewcedarî bi gotinê hebe; belê hilbijartina gotinê û bikaranîna wê di destê mirov de ye. Mirov dikare wê wekî zîv bi kar bîne û him jî dikare wekî zêr hilîne.

Bikaranîna gotinê girêdayî zanebûn û nezaniya mirov e. Lao-Tzû dibêje: "Mirovên zana zêde naxivin, belê ku yên zêde diaxivin jî nezan in." Rast e. Heta ku gotina kesên zana ji yên nezan bêtir hukim û bandorê neke şer û pevçûn, nexweşî û nebaşiyên civakî zû biz û ji holê ranabin. Em dêhn û bala xwe didin rewşa dinê, ewqas karesat û bextreşiyên ku pêk tên hemû ji gotinê der dibin. Hemîn ku gotin afirînerî başî û xerabiyên dinê ye, wê çaxê divê gotinên baş werin afirandin. Lewre afirînerê he rgotinê mirov bi xwe ye.

Wekî gotina dawî, emê dîsa bi gotina ramanwerê hêja û nemîr Arîstoteles, dawiyê li gotina xwe bînin: Mirovên ku dizanin bi hunerî biaxivin, çi tiştên ku di aqilê wan re derbas dibe nabêjin; belê çi tiştên ku dibêjin di aqilê xwe re derbas dikin."

Kaniya Helbestan

## Di Hezkirina Rewandizê de

**Besam Mistefa**

Çendîn ji Rewandizê hez dikim!
Bilindin çiyayê min/wê
Befra bîreweriyê dihelîne
Deşt,
Pencereyên dûr
Tirênên bê daniştok..

Di rê de, bi giya re radizim
Girekî li xwe mehr dikim
Dixindirme bestê
Ji rûbaran tika dikim ku rûbar bimînin
Xwe dispêrim xakê-xaka xwe-û radizim
-Jin-qereçiyên rep hene-
-Şoreşvan...-
Çixareyên ku ne diwestin..nejî xilas dibin
Û qehwe..!
Giriyê min tîne:
Bajar, gund, beyan, kolana asfalta sêwî
Rûyê dayika min, jinên reşgirêdayî
Dol, newalên ser destên terikandî
Rûyê keçeke mirî...
Dîktatorên çilmisî ku kodika min li xwe parve dikin
Şikestin....têkçûûûûn
Bihna wê....
Gundên li ber dergehê Amedê..
Mihabadê...
Belav dibim berî ku gotina xwe bêjim
Di navbera Hewraman û gundên Sablaxê de..
Çendîn qehpik û bajar min dagîr dikin!?
Zarok im
Bilind im
Bilind in çiyayên min/wê
Reşê çirisandî
Bêdengiya bi xirûcir
Û laşê dagîrkirî
Xûz dibim, ez dibêjim:
Welatê min!
Ji te hez dikim...
Ji yekem laşfiroşa te heta bi
Şehîdê te yê dawî, hez dikim!
Bê hiş berbi te ve têm
Tu sipî weke befrê,
Derbasî xewna min dibe.
Wan fêr bike ku min hişyar nekin
Di xewna xwe de te dibînim
Aniha
Bê hiş im
Bê bîrewerî me
Bajaran dikujim
Li heriya xwe vedigerim
Pêve/bi teve dibim.....

Bibhîze:
Çiqasî di tengavê de me
Tengava hezkirina Rewandiza ku min ew nedîtiye....
**6/4/2007**

www.arsivakurdi.org

# Şehîda Evînê

Selîm Zencîrî

Dema mirov dîmena hov a dijî mirovî a kuştina **Duayê** dibîne, hiş û heybet li serî de namîne, qedemên mirov dişkên, wijdana mirov diheje, pênûs dilerize û peyv tên jibîrkirin. Başe çima û ji ber çi li sedsala 21'an û di sala 2007'an de, li bihara bi xeml û rengîn ya Kurdistanê de tirajêdî û diyardeyek wiha reş, bitirs û hov diqewime, pelpelîskek weke Duayê tê şehîdkirinê û hest û sozên wê tên fetisandin.



Li bin mist û pên û kevirên komek tarîperestên dilreq û kîndar bi navê "însan" de ku reşpûşî û bêwijdanî li rûçikê wan de hewarê dike, pelpelîskek, horiyekê, stêrkek û şehîdeka evînê diqîrand û dinaland, gazîn û nalîna vê li çiyayên herî bilind yên Kurdistanê de deng vedida, lê kesê guhdarî nedikir, kes nebû ku bigihîje hewara wê, kes xuya nedikir ku wê li nav destê celad, tarîperest û dujminên azadî, eşq û evînê de bîne der. Way ji vê cinayetê!! Ey hewar sed caran hewar.

Ey Xwedê! Başe guneha Duayê çi bû, wê çi cinayet û tawanek kiribû ku hêjayê wiha cezayek hov be?

Ey Xwedê! Li gor çi Ol û mesebekê eşq û evînî heram e?

Ey Xwedê! Li gor çi yasa û pirtûkek asîmanî evînî bi tawan tê hesibandinê?

Ey Xwedê! Ger ceza û tawana evîniyê wiha giran û hov e, xwe diviya tu mirovek nemaba.

Bi rastî ku rojgarek bêwijdan û tejî ji zulm û cinayet e. Rojgarek ku kuştina mirov û perperokên bê guneh bûye Pêxora nemirov û tarîperestan.

Lê Kurdistana min tu jî!? Te jî li nava xwe de terorîst û şevperest sedsala navîn cih dane? Tu ku bi landika şaristaniyet û demokrasiyê li Rojhilata Navîn de têy naskirinê, dê weha pirîşkên demokrasî û edaletê li deverê de belav bikî? Dê wiha barana wekhevî û azadiyê bibarînî? Xa te nirx û bihayek zaf bo vê azadiyê daye, başe çima ?? Tu dizanî vê cinayet û tirajidiyê ne tenê rûreşî bo bikujên Duaya canemerg û bextreş bi cih hişt, ji berku keramet û şerafeta te jî bire bin pirsiyarê? Tu dizanî ku niha dinya li ser vê cinayeta ku li te û ji aliyê xortên te ve ji dayîk bû, dipeyive û çawan qezawetê li ser te dikin? Tu dizanî cinayeta han xaleke reş xiste nav çavên te û bandorek gelek nerênî li ser te dike. Tu dizanî hitbar û piristîja te tîne xwarê û desthilatdariya te dibe bin pirsiyarê? Tu dizanî rê ji bo destên nehez û neyar bo afirandina şerê ayînî û têkdana ewlehî û aramiya li nava te de xweş dike? Başe ger tu dizanî çima wiha bêdeng î? Çima ew dest û tilî û pêyên ku wiha hovane ji wê firîştê û perperokê dixistin, kelemçe û radestî edalet û yasayê nakî? Bawer bike ew bêdengiya te mirov pitir diêşîne û ji piristîj û berpirsiyariya te kin, û rê ji bo cinayetên din xweştir, destê dujmin vekirîtir û serkevtina wan misogertir dike.

Diyare delala min, roj nine ku bi sedan cinayetên wiha ji aliyê xortên te ve û li te ji dayîk nebin, lê wekî trajidiya Duayê eşkere ninin û tên veşartin. Lê bawer bike ew du bûyerên ku li wan çend mehên dawîn li Şengal û Behzana te de serî hildan, nayên veşartin û ji bîr kirin. Gera berê şehîdkirina bi guneha evîndarî bi xortekî kurd û misilman re, vê carê jî şehîdkirina Duayê bi vî awayî û bi guneha evîndarî bi erebek Sunnî re. Ma qey te evînî nekiriye ku wiha evîndaran ceza didî?

Belê, ew du horîkên belengaz û bêdesthilat tenê bi wê tawanê neketine boseya gurgên birsî û hov, ji ber ku guneha eslî ya wan ji dayîk bûn di welatek Îslamî, kevneşop û mêrserdest de bû. Guneha wan ya duhem jî eva bû ku jin bûn. Her lewre bû ku xetîra temenê wan temirandin û cismê pak û hîvsifet yê wan di nava xwîna sor de gevizandin, bi wê kiryarê nemirî bo Duayê û rûreşî û riswayî jî bo xwe hiştin. Başe dayîka cergsotî ya min to nikarî şîreta xortên xwe bikî!!!?

Lê Duaya canemerg, horîka bextreş û şehîda evînê xemê nexwe, dê rojek ji rojan cihê wê bûyera tal a şehîdkirina te bibe jiwangeha evîndaran û dê bi navê te bê naskirinê. Hezaran silav li ruha te hey şehîda evînê.

# DÎTINÎ ALA

Sed şukur wa nemirdim, take dîm allayî Kurd*
Kewte ber çawûm beberzî, sûret û sîmayî Kurd
Ba zebû, dûrabû dîdey nergisî şehlayî Kurd
Mijde bê emrro ke berbû, çawî pirr bînayî Kurd
Her bijî allayî Kurd û pêşewayî zanayî Kurd

Bang kene erwahî pakî Erdellanî nereşêr
Ya billên Kawe le kuyê?Rojî hezar yadit be xêr
Bênine ber çawî xotan, hellmetî zendî dilêr
Her billên em şî`re ehlî kohsarû Germesêr
Her bijî allayî Kurd û pêşewayî zanayî Kurd

Çen zemanêke esîrû jêr çepokey `alemin
Serkizû bê qîmetî ber çawî zadey Ademin
Dîlî zîndanî nezanîn, mestî badey matemin
Bang kene yektir hemûtan çunke emrro bê xemin
Her bijî allayî Kurd û pêşewayî zanayî Kurd
Qet lebîrit derneçê Kurde, zerrey zincîrî pêt
To temaşake, ledes bêganekan çî hate rêt
Kuwanê babî gorr xerîbû?Mamekey bê şiwên û cêt?
Kurde çon to dilbirînî, şel ke bo em şî`re giwêt
Her bijî allayî Kurd û pêşewayî zanayî Kurd

Newbete, baraşt lêke, aşî gêtî kewte gerr
Şêr netirsawe lebezim û şorişî meydanî şerr
Goy nedey hergîz behaşe û hoşey erbabî zerr
Hellgire em deste şî`re û dabinê sed sewllî terr
Her bijî allayî Kurd û pêşewayî zanayî Kurd

Xaneqîn mijdey eda, emrro be Diyarbekir û Herat
Pêçewaney dewrî pêşû, roj le şîmalo helat
Seyrî tîşkîke çilon rûnakî xiste ser wellat?
Em wutare bîrî dill bê, çake bo rêgey necat
Her bijî allayî Kurd û pêşewayî zanayî Kurd
Sed şukur, wa Erzerrom û Wan û Bitlîs û Çeçan
Destî daye destî Herkî, Kurdî zaza û Beban
Şarî Xerpût û Cizîre û mentîqey Berzaniyan
Ba, bebeste û çeplle û bêjin, dem be dem şam û beyan
Her bijî allayî Kurd û pêşewayî zanayî Kurd

(*)Le katêkda ke le komarî Kurdistan û şarî (Mehabad)da bû,-Qani`-em şî`rey danawe.
-Çavkanî:Dîwanî Qani`-kokirdinewey:Burhan Qani`.Çapî 4`em, Silêmanî/2001.

**Helbest: Qani`(1898-1965)**
**Veguhastina tîpan bo Latînî: Besam Mistefa**

www.arsiva kurd.org

**Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî**
**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne**

**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:** AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail:**
**agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@googlemail.com**



# Gul Di Gera Yekem Ya Dengdanê De Serneket



Gera yekem ya hilbijartina Serok Komariya Turkiyê ku roja înê, 27'ê Gulana 2007'an meşiya û berbijarê vê postê, Ebdula Gul ku diviya 367 dengan li Perlemanê de bi dest bîne, lê karî 357 dengan bi dest bixe û di vê gerê de serneket.

Biryare Perlemana Turkiyê çarşemiya tê gera duyem ya dengdanê dest pê bike. Ev hilbijartine ji aliyê çend partiyên siyasî vê hate baykotkirinê. AKP'ê bi hemû bizav û karîna xwe dixebite ku di gera duyemîn de serkevtinê bo berendamê xwe destve bîne. Ger Gul li gera tê jî sernekeve, dê li gor yasaya Turkiyê di gera sêyemîn de ku tenê niviya dengan jêre hewce ye ku bibe Serok Komar, dê serkevtinê misoger bike.

Her di vê derheqê de, Arteşa Turkiyeyê piştî hilbijartina gera yekem daxuyaniyek weşand û tê de nigeraniya xwe da zanîn. Daxuyanî dide eyanê ku nabe bihê ji bîr kirin ku Arteş alîgirê sekolarîzm û cudahiya Ol ji Hikûmetê ye. Sekolar nîgeranê vê yekê ne ku E. Gul û Erdoxan bixwazin sîstema cudahiya dîn ji hikûmetê jar û lawaz bikin. Her bi vê sedemê Perlemana Ewropayê hişyarî da Arteşa Turkiyê ku xwe ji siyasetê dûr bike

# Şayê Siwazîlandê Jina 13'an Jî Anî



Şa Meswatî yê Swazîlandê sêzdehemîn jina xwe ku berî du salan destnîşan kiribû, anî. 13'hemîn hevsera Mesweti bi navê Fîndîlî Nikambolî ya 19 salî ye. Li gor edet û dîtinên wî welatî heya niha Fîndîlî vîlayek mezin û trombêlek Almanî ya nû bi diyarî wergirtiye. Her çiqas ku Swazîland bi welatek hejar û belengaz tê nasîn û nêzî 70 ji sedê ya rûniştiyên wê ku 1.1 milyon kes in, dahata rojane ya wan kêmtir ji dolarekê ye. Nesaxiya Îdzê bi awayekî berfireh têde belav bûye ku digihîje %40 a akinciyên wî welatî.
Lê Meswatî û malbata wî di jiyanek gelek xweş û şahane de dijîn ku zaf caran bûye sedema nerihetî û nîgeraniya xelkê wî welatî. Îsal jî biryar e ku di cejna 39 saliya xwe de şahiyeke mezin li dar bixe ku tê texmîn kirin 2 milyon dolar têde bihê mezaxtin.




Mela Nesredîn kerê xwe neanîbû ku bifiroşe, ji ber ku anîbû ku xelk bizanibe çi ji destê kerê xwe dikişîne!

# Keçeke Êzêdî Bi Hovîtî Hat Kuştin

### Jinên Kurd Ew Bêxwedî Hişt, Dinya Xwedî Lê Dertê



Li gor malpera "Net Kurd" Amîne Kakebawe ya ji rêxistina Partiya Çep a Swêdê (Vänster partiet) ragihand ku partiya wan bi niyaz e nameyekê arasteyî parlamentoya Swêdê, rêxistinên mafên mirovan, Amnesty International bike ji bo sînorkirina tundûtûjiyên li dijî jinan ên li Kurdistanê.

Kakebawe ragihand ku partiya wan dê nusxeyeka wê nameyê arasteyî hukumeta Kurdistanê û hukumeta Iraqê jî bike.

Ji alî din ve rêxistina Amnesty International xwe amade dike ku kampanyayeka cîhanî ya li hember kuştina keça kurd a êzîdî Duayê veke.

Wek tê zanîn keça kurd Dua ya 17 salî di 7-ê nîsanê de ji bo ku "peywendiyên wê bi kurekî misilman ê ereb re hatibû dîtin", li meydana gundê Başîke yê ser bi Mûsilê ve hat lînçkirin, bi kevirbaranê hat kuştin, êrîşkaran bi xwe fîlma kuştina wê bi kamerayên telefonan kêşan û ew belav kirin. Fîlm berê di malperên ereban de li dijî kurdan û êzîdiyan wek kampanyayekê hat weşandin, pişt re kanala televizyona tirkî D, fîlm wek kampanyayeka li dijî desthilata kurd weşand.

Mixabin lii Kurdistanê didestpêkê de, ragihandina kurdî li hember vê hovîtiyê bê deng ma. Heta nuha nayê zanîn ev erîşkarên bêwîjdan hatine girtin an na, tu hesab ji kesê hatiye pirsîn an na.

Bêdengiya rêxistinên sivîl ên kurd û Kurdistanê, bi taybetî jî ya jinên Kurdistanê û ronakbîrên kurd gelek balkêş e. Ev bêdengî belkî ji wê êrîşa kevirbarankirin bikomî ya ser keçikê û kuştina wê jî xerabtir e.

# Hêlik Pêşgîriyê Li Hember Dudiliyê De Dike



Vekolîna nû ya pijîşkî eşkere kir ku xwarina hêlikê, parêzerê mirov e ji dudilî û wazwaziyê. Herwiha xwarina wê tevî şîvê de laşê mirov ji vê mandîbûna ku bi dirêjahiya rojê de tûş bûye, rihet û aram dike.

Li gor nûçeya rojnameya "Eharm"ê, xwarina hêkê, heza xwarina şîrînî û tiştên şîrîn kêm dike ku xwarina wan bo kesên qelew û nesaxên şekirê zirar heye. Li gorî vê çavkaniyê, xwarina hêlikek kelandî di rojê de, mirov ji tûşbûn bi nesaxiya penceşêrê diparêze, ewa jî bi sedema hebûna **Fînole** û **Vîtamîna D** li Hêlikê de.

www.arsivakurd.org